



**Umîd Demîrhan**

**Hînkerê**

**Zîmanê**

**Kurdî**

**1**

**Perwerdehiya Destpêkî**

***Çapa jimarîn a bêpere***



































# Deng û Alfabe

Tîpên Mezin	Tîpên Biçûk
Kîtekirin	Jimareyên Bingehîn

## DESTPÊK

1. Bala xwe bide tîpên mezin û biçûk. Tîpan bi dengê bilind bixwîne.

a b c		A a  agir		a b c 	
B b  beq	C c  canî	Ç ç  çêlek	D d  dar	E e  elok	
Ê ê  êzing	F f  find	G g  gore	H h  hesp	I i  I i --> bizin	
Î î  îsot	J j  jûjû	K k  kevçî	L l  lepik	M m  mişk	


N n 	O o 	P p 	Q q 	R r 
nan	otobûs	pîvaz	qelûn	roj
S s 	Ş ş 	T t 	U u 	Û û 
sêv	şêr	tirî	U u--> gul	ûfî
V v 	W w 	X x 	Y y 	Z z 
vizik	werdek	xanî	yek	zebeş












## 2. Bikaranîna tîpên mezin û biçûk bibîne.

tîpên mezin	di peyvekê de	tîpên biçûk	di peyvekê de
A	Agirî	a	agir
B	Bazîd	b	berf
C	Colemêrg	c	cot
Ç	Çewlik	ç	çar
D	Delal	d	dar
E	Erzingan	e	endam
Ê	Êlih	ê	êvar
F	Firad	f	firîn
G	Gulperî	g	gulav
H	Hawar	h	hêlîn
I	Iraq	i	inteint
Î	Îlam	î	îsal
J	Jiyan	j	jin
K	Kirmanşan	k	kevir
L	Lezgîn	l	lepek
M	Miraz	m	mezin

N	Nemrûd	n	nal
O	Oremar	o	oreor
P	Perîxan	p	pirtûk
Q	Qers	q	qeşa
R	Riha	r	reng
S	Semsûr	s	sal
Ş	Şêrko	ş	şev
T	Tendûrek	t	tu
U	Urmiye	u	umîd
Û	Ûrisat	û	ûd
V	Vîndar	v	varik
W	Wan	w	welat
X	Xabûr	x	xew
Y	Yezdan	y	yek
Z	Zagros	z	zêr

3. Bala xwe bide jimareyên bingehîn û hînî xwendina wan bibe.



 <b>bizinek</b>	
 <b>du çivîk</b>	 <b>şeş perperok</b>
 <b>sê beraz</b>	
 <b>çar şêr</b>	 <b>heft rovî</b>
 <b>pênc mirîşk</b>	
	<b>neh xêz</b>

4. Bala xwe bide kîtekirina peyvan û tu jî nimûneyan çêke.

#### KÎTEYEK TENÊ

av,  
ba,  
çar,  
kêr,  
şûr,  
xwê,  
dest,  
şkeft

#### DU KÎTE

ba-ran = baran,  
par-tî = partî,  
sa-rinc = sarinc,  
bi-rinc = birinc,  
keş-tî = keştî,  
des-tar = destar,  
kar-tol = kartol,  
mer-tal = mental

#### SÊ KÎTE

per-pe-rok = perperok,  
ker-de-nek = kerdenek,  
hê-le-çan = hêleçan,

#### SÊ KÎTE

roj-na-me = rojname,  
bê-rî-van = bêrîvan,  
te-le-fon = telefon,

5. Komekê bi hevalan re çêke û bila her kesek nimûneyekê bixwîne.

A a



Av

Ava kaniyê  
Ava kaniyê sar e.  
Ava kaniyê dikişe.  
Xuşexuşa avê tê.



Agir

Agirê daran  
Agirê daran gur e.  
Agir dişewitîne.  
Agirê Newrozê geş bikin.

B b



Beq

Beqa avê  
Beqa avê qurequr dike.  
Hemû beq qurequr dikin.  
Qurequra beqan tê.



Bask

Baskê çivîkan  
Baskên balindeyan  
Baskên çivîkan hene.  
Çivîk û balinde bi baskan difirin.

C c



Canî

Caniyê viringî  
Caniyê viringî naçêre.  
Caniyê viringî şîr dimije.

Ç ç



Çay

Çaya kel  
Çaya kel zîrarê dide qirikê.  
Çaya kel venexwe.



Car

Carek ji caran  
Carek ji caran mêrxasek hebû.  
Kaniya mêrxasan namîçiqe.  
Mêrxasî û tirxesî ne yek in.



Çêlek

Çêleka belek  
Çêleka belek diçêre.  
Çêleka belek di mêrgê de diçêre.  
Bêrîvan çêlekê didoşe.

D d



Dar

Dara sêvê  
Dara sêvê bilind e.  
Sêva çê para hirçê ye.  
Sêva kurmî dikeve erdê.

E e



Em

Em kî ne?  
Em kurd in.  
Welatê me Kurdistan e.  
Zimanê me kurdî ye.



Def

Dengê defê  
Dengê defê ji dûr ve xweş e.



Elok

Elokê me  
Elok ji mirîşkan mezintir in.

Ê ê



Êzing

Êzingê şewatê  
Êzingê şewatê ne erzan e.  
Êzing malê germ dikin.



Êş

Êşa diranan  
Êşa diranan dijwar e.  
Ger diran biêşe, derman kêş e.

F f



Find

Finda virekan  
Finda virekan damirî.  
Finda virekan zû dadimire.



Fal

Fala falbêjan  
Fala falbêjan tijî derew e.  
Ji falbêjan bawer mekin.

G g



Goşt

Goştê xweş  
Goştê berxan  
Goştê berxan xweş e.

H h



Hesp

Hespê boz  
Hespê bezê  
Hespê boz dibeze.





Gore

Goreya wê  
Ev gore nû ye.  
Ev goreya nû neqîşandî ye.



Hirç

Hirçê çolê  
Hirçê çolê hov e.  
Hirçê hov nêçîrek girtiye.

I |



Ingilistan

Ingilistan welatek e.  
Ingilistan welatê ingilîzan e.  
Paytextê Ingilistanê London e.

Î î



Îsot

Îsota tirşikê  
Îsota tirşikê kê m e.  
Çêja îsotê tûj e.



Inteint

Inteinta nexweşan  
Inteinte nexweşekî tê.  
Nexweş dikin inteint.  
Berê dîwaran mala rebenan e.



Îşev

Îşev hewa germ e.  
Îşev hewa sar e.  
Îşev hewa hênik e.  
Îşev sar e, cilik sitar e.

J j



Jûr

Jûra mêvanan  
Jûra razanê  
Jûra zarokan  
Jûra mêvanan paqij e.  
Çar jûr di mala me de hene.



Jûjî

Jûjîyek  
Jûjî direve.  
Jûjî ajaleke çolê ye.

K k



Kar

Karê wan  
Karê wan tuneye.  
Karê min heye.  
Karê kê tunebe ew betal e.  
Mirovê betal birçî dimîne.



Kevçî

Kevçiyê çayê  
Kevçiyê xurekî  
Kevçiyê çayê biçûk e.

L l



Lepik

Lepikên xebatê  
Lepikên xebatê bikire.  
Lepik destan diparêzin.

M m



Mar

Marê reş  
Marê reş ziyankar e.  
Jehra marê reş tîr e.



Lod

Loda gihayê kode  
Ev lod çend part e?  
Ev lod sê part e.



Mişk

Mişkê malê  
Mişkê malê ji pisîkê ditirse.  
Mişkan çewal qul kiriye.

N n



Nan

Nanê sêlê  
Nanê tendûrê  
Nanê sêlê xweş e.

O o



Otobûs

Otobûsa Amedê  
Otobûsa Amedê çûye.  
Otobûsa Amedê hatiye.



Naxir

Naxira gund  
Naxira gund vedigere malê.  
Naxira gund diçe çêreyê.



Oreor

Oreora çêlekê  
Oreora çêlekê diçe esmanan.  
Kûçik direye û çêlek dibore.

P p



Pîvaz

Pîvazên hişk  
Pîvazên ter  
Pîvazên ter bi çendan in?



Penêr

Penêrê malê  
Penêrê hazir  
Penêrê hazir bêtehm e.

Q q



Qelûn

Qelûna cixareyê  
Qelûna kalikê min  
Qelûna kalikê min dirêj e.



Qaz

Qaza spî  
Qaza kulek  
Qaza kulek nexweş e.

R r



Roj

Roja diduyan  
Roja diduyan were.  
Dîtira rojê were.

S s



Sêv

Sêvên sor û zer  
Sêva çê  
Sêva çê para hirçê.



Rovî

Roviyê kone  
Roviyê kone birçî ye.  
Rovî birçî dimîne, diçe nêçîrê.



Sîr

Seriyek sîr  
Seriyek sîr biavêje nava tirşînê.  
Bêhna sîrî kirêt e.

Ş ş



Şêr

Şêrê daristanê  
Şêrê şêr ji roviyekî natirse.

T t



Tirî

Tiriyên reş  
Tiriyên reş hatine bazarê.



Şev

Şeva çûyî  
Şeva çûyî hewa sar bû.  
Şeva çûyî hewa germ bû.



Ta

Tayê rîs  
Tayê xalîçeyan  
Tayê xalîçeyan rengrengî ye.

U u



Urf

Urf û adet  
Urf û adetên gelan hene.  
Newroz urfeke gelê kurd e.



Umîd

Umîda me  
Umîda me azadî û aşî ye.  
Umîda rebenan nanekî tisî ye.

Û û



Ûfeûf

Ûfeûf dike.  
Zarok ûfeûf dike.  
Zarok ûfeûf dike û digirî.



Ûş

Êş û ûş  
Êş û ûş lê rabûne.  
Êş û ûşên belengazan naqedin.

V v



Vizik

Vizvizîk  
Vizvizîk dizivire.

W w



Werdek

Werdeka avê  
Werdeka avê difire.



Varik

Varika zer  
Varika zer hêk kiriye.



Weris

Wesisê riziyaî  
Wesisê riziyaî zû diqete.

X x



Xanî

Xaniyê me  
Xaniyê me yekqatî ye.

Y y



Yek

Yekitî  
Yekitiya Mamosteyan ava bûye.



Xort

Xortê bedew  
Ev xort diçe dibistanê.  
Vî xortî kincên hêşîn li xwe  
kirine.



Yane

Yaneya Nivîskaran  
Yaneya Nivîskarên Kurd  
Yaneya Xwendekarên Kurd li ku  
ye?

Z z



Zebeş

Zebeşê Amedê  
Zebeşê Amedê navdar e.

XW xw



Xwelî

Xweliya sor  
Xweliya sor li vir heye.

## 6. Digel hevalekî xwe vê çîroka Kêçê bixwîne.

Hebû û tunebû, rojek ji rojan kêçek hebûye. Rojêke zivistanê kêç hilkişiyaye ser qeşayê da ku xwe bişimitîne. Lêbelê ji nişkê ve kêç gêr dibe û lingê wê dişkê. Kêç hêrs dibe û ji qeşayê re dibêje:

-Wey qeşayê te çima lingê min şikand?  
Qeşayê gotiye:  
-Ez qeşa bibûma, tavê li min nedida.  
Kêçê gotiye:  
-Wey tavê çima tu li qeşayê didî?  
Tavê gotiye:  
-Ez tav bibûma, ji pişt heft çiyayan dervediketim.  
Kêçê gotiye:  
-Lo çiyayo tu çima heft caran derdikevî pêşiya tavê?  
Çiyayî gotiye:  
-Ez çiya bibûma, bizin li ser pişt min nediçêriya.  
Kêç dibêje:  
-Wey bizinê, tu çima li ser pişt çiyayî diçêrî?  
Bizin dibêje:  
-Ez bizin bibûma, guran nedida pey min.  
Kêç dibêje:  
-Hey guro, tu çima didî pey bizinê?  
Gur dibêje:  
-Ez gur bibûma, kûçikan bera min nedida.  
Kêç dibêje:

-Hey kûçiko, tu çima bera gur didî?  
Kûçikî gotiye:  
-Ez kûçik bibûma, gava ez li ber deriyê xanimê diketim wê pariyek nan bida min.  
Kêç dibêje:  
-Wey xanimê, tu çima nê nê nadî kûçikî?  
Xanimê gotiye:  
-Ez xanim bibûma, mişkî dîwarê min qul nedikir.  
Kêç dibêje:  
-Hey mişko, tu çima dîwarê xanimê qul dikî?  
Mişkî gotiye:  
-Ez mişk bibûma, pisîkê bera min nedida.  
Kêç dibêje:  
-Wey pisîkê, tu çima bera mişkî didî?  
Pisîkê gotiye:  
“Ez him dikim, gim dikim,  
oxweş û misteheq dikim,  
hevrişkan di ber te de reş dikim,  
heft salan te nexweş dikim”.

(Ji pirtûka bi navê Çîrokên Zarokan a Seîd VEROJÎ hatiye wergirtin û ji bo zarokan hatiye hêskirin)